**Cejna Yaran - Qeweltas di çanda Kurdî-Yarsanî de.**

Nivîs: Qendîl Şeyxbizînî.

Yarsanî yek ji dînê dêrîn û kevnareya Kurdî ye ku ew jî weku “Zerdeştî û Êzîdî”yê reh û rîşeya wê ji fikir, felsefe û dînê Mîtrayî û Mêhrayê tê. Pirtûka Yarsaniyan “Serencam”e. Li gor deverên cuda cuda navê wê dînê jî bi çend curan hatiye ku sê nav zêdetir berçav û diyar in ew jî “Yaranî, Kakeyî û Ehlê Heq” in. Her weha gelek kesatiyên mezin weku Pîr, Kake, Babe, rêberên wê dînê ne weku “Şahxoşîn, Babe Serheng, Babe Yadgar, Babe Tahîrê Hemedanî, Pîr Şalyar û San Sahak” yd.. Lê San Sahak weku referomkarê wê dînê û serdarê wê dînê ji hemûyan balatir û mezintir e. Dînê yarsanê bi pergaleke gerr û dewranê derbas dibe ku her dewranekê 300 sal in û San Sahak di gerr û dewrana heştemîn de bûye. Peyrewkarên wê dînê li Rojhilatê Kurdistanê Loristan, Hewraman, Hemedan û Erdelanê hene. Li başûrê jî li Germiyan, Kerkûk û Musilê hene. Xnecê wê li Atropatyan(Azerbaycan)ê jî hene, helbet li hin derên din jî hene û belav in.

Di dînê Yarsanî de du rojî girtin û cejn girtin hene ku rojîgirtin û cejngirtina “Yaran-Qeweltas û Merrê Newê/Merrew Newê/Merrno”yê ne.

Cejna Qeweltasê yek ji cejn û boneya Kurdî-Yarsanî ye ku di çileya sivistanê de ye û reha wê cejnê jî girêdayî çîrokeke ku bi du awayî tên vegotin û mîtolojî û serhatiya bûyerekê bi hev re girê dide di bîr û baweriya dînê Yarsanê de.



Serhatiya yekemîn weha ye ku, heft yarên mezin ên Yarsanî bi navên “Qulî, Şabdîn, Şake, Şah Nezer, Îsa, Şah Murad, Pîr Dilawer”, Her heft kes ji herêma Ûrmiyê û bajarê Selmasê ya rojhilatê Kurdistanê re ber bi Hewramanê tên bo dîtina “San Sahak” li gundê “Perdîwer”ê. Di zivistaneke sar û seqem de rê tof û berf dibe, tên hetanî nêzî çiyayê Şahoyê dibin, li wir ruh mezinî di wan de çê dibe û dibêjin: “San Sahak, san û şahê cîhanê, çima nayê pêşwaziya me ku rêyeke kin û demeke kin maye. Heft yaran nêzî şikefta li çiyayê Şahoyê bûn. Lê li hemberî vê ruh mezin bûnê, ew ketin ber nefr û hêrsa “Kemandar”î û her heft kes ketin binê berfê ku sê şev û sê rojan di binê berfê de man.
Hin çavkanî dibêjin: bi fermana “San Sahak”î ketin binê berfê ku San Sahak ji “Mustefa Dawdan” re got, di vir de “Mustefa Dawdan” heman “Îzraîl”e ku ferîşteyê giyankêşanî ye.
Hin çavkanî jî dibêjin ew ketin binê berfê û “San Sahak” ji “Mustefa Dawdan” re got: here pişt wî çiyayî, li wir pele ewrek heye ku heft sale danebariye, here wî bîne û dabarîne ser heft yaranên Qeweltasê daku wê berfê behele. Ferîşteyê giyankêşanê jî çû ferman da ewrê ku sê şev û sê rojan dabibare ser berfê ku berf bihele û berf heliya, dît ku ji ber birçîbûn û sermabûnê yaran giyan dane û mirine, “Kemandar” ew bi mirîtî birin pêşberî zatê Heq şahê cîhanê San Sahak, ew jî ji “Pîrê Şert - Binyamîn”î re got: konekî spî veda û ji “Kake Pîre”yî re jî got: termên heft yaran amade bike, dû re şahê cîhanê bi gopalê xwe û got: bi fermana xwedawendî “Hûrzdê – rabin”, ji cîhana enderê her heft yaran dîsan zîndî bûn û sûjdeya spasdariyê ji keremdarê re kirin. Heft Yarên Qeweltasê piştî zîndîbûnê, ji San Sahakê re efû xwastin, San ji wan re got: li hemberî efûkirina we, gerek hûn tam mehekê rojî bigirin. Ew jî ji San re gotin: keremdar, em ehlê heq! rojiyê çi? Keremdar jî got: ehlê heq rastî guman bibe divê wî karî encam bide. Yaran jî dîtin ku San ewan efû nake, ew jî ji “Pîr Binyamîn” re gotin ku dadekê ji wan re bike, pîrê şert “Binyamîn” jî berê xwe da San û got: mezin û serwerê min, hêvîdar im ji ber xatirê biçûktirîn xizmetkarê xwe yaran ji wê gunehê efû bikî. San got: Pîr Şert, bi mercekê yaran efû dikim, divê li ser şertê Binyamîn bin û li pey hezên xwe nekevin, her gav ku Yaran merc û payeyên îmanî yên xwe cîbicî nekin, ji civata yaran terk dibin. Ey pîrê Şert “Binyamîn” divê Yaran sê rojan rojî bigirin û dûre cejn bigirin.

Serhatiya duyemîn li gor metnên pîroz ên Yarsanî, heft yarên mezin ên dînê

Yarsanî  bi navên “Qulî, Şehabedîn, Şake, Şah Nezer, Şah Murad, Îsa, Pîr Dilawer” ku ruhê bazneyê heftewane di wan de şênber e, ji bajarê “Selmas”ê bi mebesta bi xizmet gihiştina “San Sahak” ber bi “Perdîwer”ê anku gundê “Şêxan” li Hewramanê ketin rê, dema gihiştin nêzî çiyayê Şahoyê, li wir di nava tof û berfê de asî man û sê rojan ti tiştek nexwarin. Ji bo hatin û mêvaniya heft Yaran “San Sahak” û yarên bi wî re bazneyê ruhî û civata zîkîrê saz kiribûn û ti tişt jî nexwarin, bo roja sêyemîn, bi fermana “San Sahak” her yek ji “Dauwdê Rêber û Mustefa Dewdanî, ji Pirdîwerê re çûn ber bi çiyayê Şahoyê, di wê rojê re rewşa hewayê xweş bibû, dûre hemû bi hev re hatine xizmeta “San Sahak” û êdî li Pirdîwerê cejn li darxistin û pîroz kirin.



Helbet cudahî di rojîgirtin û cejngirtinê de hene, Hindibêjin: roîgirtina Qeweltasê ferz e li ser hemû bawermendên dînê Yarsanî ku ji temenê 6 salî ve rojî bigirin, hin jî dibêjin: rojîgirtin neferz e. Yarsanî piştî sê rojan rojîgirtin, cejn digirin yanî hem rojîgirtin û hem jî cejngirtin yek ji pîroziyên dînê Yarsaniyê ye.

Lê derbarê rojîgirtin û cejngirtina dî anku “Merrê Newê/Merrew Newê/Merrno”yê, ew jî her sê roj in, Ew jî du nêrin hene, hin dibêjin: rojîgirtin ferz e û lê hin dibêjin: ne ferz e û her kes azad e ji rojîgirtin yan negirtinê.

Piştî sê rojan rojîgirtinê ji 14ê çileya mezin ta 17ê çileya mezin û bo roja çarem cejn digirin ku ew cejn jî pênc rojan dewam dike. Xwarinên birinc û dîkil bi duhnê tên çêkirin di her şevekê de, her weha nanê pîroz ê “Girde”ê yek ji taybetmendiyên wê cejnê ye, qûrbanî kirin yekî dî ji merasîma wê cejnê ye. Her weha nanê sêlî bo şukrane û spasdarî tên belav kirin, xencê wê mêwe roleke giring dibîne bi taybetî mêweya “Henar”ê û kulîlk û şîrîniyê ku wê dibin “Cemxane”yan û li wir bi tenbûr û zîkîr wê cejnê pîroz dikin û xelkî serdana “Cemxane”yan dikin û pîrzobahiya hevdu ya cejna Qeweltasê dikin.



Li ser diyarkirina rojên wê ka em berê xwe bidin vê hûzanê ku dibêje:

**Ney çiley zimistan ney çiley zimistan**
**Dawud roçeşan ney çiley zimistan**
**Niyetşan çiwarda û mangê bo îhsan**
**Ce hevde û mangê gîrya çep destan**

*Têbînî: “Newê” navê gundekî dêrîn û kevnar e, şûnwareke dikeve binarê çiyayê Sûrênê*

Bo niyeta di rojîgirtina “Qewltas”ê de tê gotin:


“Sê rojan rojî digirim bi eşiqa yarên “Qeweltas”ê, ji me rojîgirtin û ji heq pejirandin, ewel û axir yar, ezîz şahê xawenkar”.

Bo niyeta di rojîgirtina “Merrê Newê/Merrew Newê/Merrno”yê de tê gotin:

**Ewell û axirman yar**
**Niyetman hawirden niyet yerê roy yar**
**Niyetman hawirden niyet xawenkar**
**We îşiq yaran merrenwî dauwd, Bnyamîn û Pîr Musî**
**Her kes negêro yerê roy yarî**
**Ne kero dawat padişayî**
**Beşiş nime yan çe xerman duçiyayî**.

Lê cudahî di erk û awayê rojîgirtinên “Qeweltas” û “Merrê Newê/Merrew Newê/Merrno”yê û dema wê de hene.

Rojîgirtina “Qeweltas”ê dikeve nava çileya mezin û li gor kelamên Perdîwerê di çardeya çileya mezin de divê rojiyê bigirin ta hevdeh û di hevdehê de cejn bigirin.



Lê rojîgiyê “Xawenkar” di 12ê çileya mezin de tê encam dan.

Şahê mezin San Sahak dibêje:
**Beydê binîşîm pûlî ham milê,**
**Yerî roy yaran ama ew dilê,**
**Duwazde û ma nedilê çilê.**

Anku: Yaranî yên hevsoz û hevpeyman, werin rûnên, vaye rojiya sê rojên yaran hat, di roja 12ê çileyê de.

Şahê Hewraman dibêje:
**Dawud roçeşan ney çile û zimisan**
**Niyetşan ne çuwarde û mangî bo îhsan**
**Ce hevde mangê bigêra çepdesan,**
**Îdşan pey to bûnî sermesan,**
**Niyet û roçeşan pey Qewtasan**.

Anku: Ey Dawud rojiyê yaran di çileya zivistanê de ye, niyet anîn di çardehê çileyê dibe û di hevdehê de “Çepdest” bikin ku nîşana cejnê ye û jêre “Çeprezbar”ê jî tê gotin. Cejna “Qeweltasê ji bo şad bûna te ye û bi navê “Qeweltas”ê rojî bigirin.

Her weha cudahiyeke dî ya “Qeweltas û Merrê Newê/Merrew Newê/Merrno“ ew e ku Yarsanî nabe sê rojên “Merrê Newê/Merrew Newê/Merrno”yê kêm bike.

Kekam dibêje:
**Her kesê roçey padşam kil kero**
**Paşam wesirr teqsîr gunahiş mewyero**

Anku: Her kes roja padişahê min kil û kêm bike, padişahê min kêmkarî û gunehên wî efû nake. Lew hin weha dibînin ku rojînegirtina “Qeweltas”ê mîna “Merrê Newê/Merrew Newê/Merrno”yê nabe guneh û tawan.
Yan jî dibêje:
**Merde sê roçe zînde şanî kerd**
**Perê şukirane îdşanî kerd**

Anku: Kesên ku sê rojan mirin û zîndî bûn, ji spasdariyê re bû cejna wan. Lê dema em defterê dinêrin, dibînin ku ferza sabit e rojiya sê rojeyên Qeweltasê.

Pîr Binyamîn dibêje:
**Kerdêş asanen, kerdêş asanen**
**Nekerdêş muşkil, kerdêş asanen**
**Yar ka'beya şerîf, qîbehy xasanen**
**Çe eşiq yaran Qeweltasanen**

Seyd Xamoş dibêje:
**Dudane gewher negoş ber awerd**
**Kêşaş ew niyaz Binyamîn şert**
**Pîr wêş nasa sultan sirr poş**
**Gewher bî we pirç perê sey xamoş**
**Gewher bî we pirç pirç bî we elmas**
**Elman bê we remz yar Qeweltas**

San Sahak dibêje:
**Çe serîn basî..**
**Şahûmn kêşa çe serîn basî**
**Tasim asimang xeziram qiyasî**
**Merrûman niya pa Qeweltasî**
**Çe eşiq yaran çuwarde exlasî**
**Tawisanman gêlina çe zimisan rasî**
**Zimisan û mestî çilem esasî**
**Kesê nenyerû û fitne û weswasî**
**Niyet yerî rûm çilem mabasî**





*Têbînî: Navê “San Sahak” bi gelek awayêndin jî hatiye weku”San Sehak, San Îshaq, Şahê Hewramn, Şahê Cîhan, Zatê Heq, Rêberê Yarsan” yd..*